



Interessengemeinschaft Erstsprachen - vpod Interkulturelle Bildung -
Postfach 8279 - 8036 Zürich Tel. 044 295 30 00 / urs.loppacher@vpod-
zh.ch

BANG

Destekdayîna Zimanê Destpêkê Yê Zarokan Erkeke Bingehîn A Saziyên Perwerdê Ye

Çima bangeke wiha?

- Cûrbicûriya ziman rastiyeke civakî ye. Mafê hemû zarokan ê sûdgirtina ji vê û tevlêbûna vê heye.
- Fêrbûna ziman, parastin û pêşdebirina zimanên fêrbûyî, ji girtina jêhatiniyên binavkirina zimanzanî hîn pêşdetir e. Wateya vê, westandina mejî ya di derbarê nêrînên cihanê û çandan de ye. Hebûna girêdanan a di navbera jêhatiniya ramandin, civakîbûn û çêbûna nasnameyê de, eşkere ye. Ziman hîmê bingehîn ê ragihandin û fêrbûnê ye. Bi vê sedemê, erka bingehîn a saziyên perwerdeyê, di her wateyê de bi berdeyamî destekdayîna fêrbûna ziman e.
- Pêşemîniya fêrkirina zimanê dibistanê yê herêmê heye. Şertê hebûna di nava civakê de, birayebûna di vî zimanî de ye. Wekî lêgerînan daniye holê, divê dibistan di zimanê dibistanê yê herêmî de, zêdetir destekê bidin zarok û civanên bi du yan zêdetir zimanan, bi nêzîkatiyeke cudahiyan berçav digre, têgihiştina dersan a zarokên di navbera wan de cudahiya astê heye, dikare pêk were. Fêrbûna zimanên cihereng bi navbenkariya rêbazeke perwerdê ya ji zimên jordestir dikare bi hev re were peywendidarkirin.
- Zarokên zimanê destpêkê fêr bûne ne zimanê wanî perwerdê ye, zimanê perwerdê wekî zimanê duwem, heta sêyem ango çarem fêr dibin. Malbatên van zarokan an ji herêmeke swîsre yê zimanekî cihereng lê tê axaftin an ji welatekî din koç kirine ango zimanê dê û bav cuda ne. Ev zarok bi du yan zêdetir zimanan digihêjin. Ev wekî dikare bibe avantajek, bi taybetî, ji aliyê zarokên koçber ên bi du yan zêdetir zimanan îro zêdetir vedigere dezavantajê. Ev rewş xwe bi taybetî di refên herî asta jêrîn de yê dibistana navîn (sekundarstufe) û di refên zarokên bi pirsgirêk rêdikinê de, di tîrbûniya wan de, di dibistanên perwerdeya berçav a pîşeyî didin de û di dibistanên perwerdeya navîn a ber bi zankoyê ve de, di



ketina hijmara wan de diyar dike. Dibistanê dewletan tenê dema van newekeheviyên avahî ji holê rakin, dikarin îdiaya dibistanbûna herkesî heq bikin. Di dema fêrbûna zimanê xwe yê destpêkê de, destekdayîna zarokên bi du yan zêdetir zimanan digihêjin, di ramana wan û di liv û tevgera wan de, pêşveçûna wan a pir alî, çêkirina wan a nasnameyeke xurt û bi vî awahî li dibistanê ghiştina serkeftineke baş pêk tîne.

- Ger saziyên perwerdeyê du yan pirzimanîyê teşvîq bikin, ji bo van zarok û malbatên wan ên bi du yan pir zimanan digihêjin, heta ji bo mirovên bi zimanekî digihêjin jî wê awantajekê pêk bîne. Perwerdeya piralî wê derfetê ji ragihandina piralî re çêbike, li Swîsre û li tevahiya cîhanê wê şansê bi hev re jiyîn û xebata pirçandî pêşkêş bike.
- Di dibistanan de, fêrbûna zimanê destpêkê û zimanên din, mafê mirov e. Ji koçberan re pêşkêşkirina derfeteke perwerdeya baş û di zimanê wan de jî pêkanîna vê derfetê, li berjewendiya tevahiya civakê ye. Ev tenê ne ji aliyê vegirtina zimanan ve, berûvajî, bi pîvaneke mezin li gorî berjewendiya aboriyê ye jî. Di zimanên destpêkê de fînansekirina dersan jî, (heta niha di zimanê dayikê de û di çandê de ya bi awayê qûrsan hatiye kirin) bi vê sedemê pir rast e.
- Dersên di zimanên destpêkê ên cuda de (Qûrsên di zimanê dayikê de û çandê de) jêhatîniya zimanê zarokan û bixwebawerkirina wan li pêş dixê. Tecrube şanî didin ku, pêşdebirina bixwebarkirinê parçeyek ji yê çêkirina entegrasyon û xebatên pêşîgirtina li diwariyê ye. Di vê wateyê de derseke wiha, bi pîvaneke mezin wê bandûrê li ser derdora dibistana zimanek lê serdest e bike û cewekî baş (atmosfereke baş) ê dibistanê biafirîne.
- Saziya dibistanê bi nasîn û grîngîdayîna pirzimanîyê (ne tenê li ser kesên hîlbijare yên perwerdebûyî) wê bandûra xwe ya erênî bi pîvaneke mezin zêdetir bike.

Bang

- Teşvîqkirina zimanê ku zarok destpêkê fêr bûne, ji bo saziyên perwerdeyê erkeke bingehîn e.
- Organîzasyon û kesên yeko yeko ên ev destxet kirine, li swîsre ya welatekî çar zimanên fermî û zimanên din lê tîn axaftin, pêkanîna potensiyelê ya pirzimanîyê û ji bo



pêşdebirina pircûrehiya di van zimanan de, di mijara bûyîna meseleyeke bingehîn a saziyên perwerdeyê yên Swîsre de hevraman in.

- Wekî pêwîstiya vê jî, Federasyona Swîsre EDK (konferansa Rêvebirên Perwerdê) berpirsyarên polîtîkaya perwerdeya ziman ên di hundirê kanton û şaredariyan de, bi hemû hêza xwe, ji aliyê naverok, dadî, organîzasyon û finansê ve bangî bûyîna di hişmendiya berpirsariya xwe de dike û ji bo zimanên cuda ên destpêkê hatine fêrbûn bi dersên(Qûrsên HSK di zimanê zikmakî û çandê de) heta niha di saziyên perwerdê de pêk hatine re werin entegrekirin, bangî xebata hevbeş a bi van saziyan re dikin.
- Bi navbenkariya tedbirên organîzasyona Qûrsên HSKê yên Rêvebirên Perwerdê yên Swîsre ji bo destekdayîna kantonê girtina biryara HarmoS Konkordat ê destek dikin û vêna wekî gaveke grîng a di aliyekî erênî de dinirxînin. Bê derneqmayîn pêkanîna kantonan a vê yekê daxwaz dike û ji EDKê, bi navê kantonê, ji bo navendî û destekdayîna xebatên koordînê, avakirina buroyekê dixwazin.

Komîteya peywendîdar a zimanên destpêkê daxwazên ji Federasyona Swîsre, ji EDKê (Konferansa Rêvebirên Perwerdê) û ji Kanton û Şaredariyan kiriye:

1- Nasîn û teşvîqkirina pirzimanî ya saziya dibistanê, û bicihkirina vê ya li hîmê bingehîn ê sazûmana perwerdeyê pêwîst e. Teşvîqkirina zimanê destpêkê, yê bernameya asayî ya perwerdê ye. Ev yek, divê ji herkesê dixwaze fêr bibe re vekirî be. Armanç dayîna jêhatîniya zimên a di gelek zimanan de lêbelê pê re teşvîqkirina entegrasyona zarokên pirzimanî di dibistan û civakê de ye.

2- Li gorî madeya 4. a HarmoS konkordatê ji bo destekdayîna qûrsên HSKê, bê derengmayîn ji aliyê hemû kantonan ve, pêkanîna tedbirên organîzasyonan, xistina ser rê û berfirehkirina wan pêwîst e. Gava divê destpêkê were avêtin, di refên di dibistanan de û di hundirê saetên dersan de çêkirina dersên ziman ên destpêkê (HSK) , bi awayekî fermî destekdayîna bi malzemeyên dibistanê û li ser qerneyê diyarkirina serkeftinên di van dersan de ye.

3- Li HarmoS Konkordata di çarçoweya xebatên reformê de gavên divê bê derenghiştin werin avêtin:



A- Zimanên destpêkê, ji malbatê derbasbûna dibistanê de, di saziyên destekdar û tamamkerê malbatê de, di dibistanên bingehîn û refên amadekarî yê nû ketine pêkanîne de, (di qonaxa bingehîn û esasî de), divê teşvîqkirina wan bi hişmendî were domandin. Dersa ziman a destpêkê wekî dersa hilbijarî, li dibistanên navîn û pîşeyî, ji bo biderfêtkirina qedandina lîsê ya bi du zimanan, di dibistanên dewletê de, heta qonaxa duwem a dibistana navîn were dayîn. Agahiyên ziman ên di dersa zimanê destpêkê de divê derbasî qeydê werin kirin û bi sertîfikayê werin pelikandin (notên qerneyê, port folye a ziman, sertîfîka). Agahiya zêdetir di dema biryara hilbijartina pîşeyî de divê were nasîn.

B- Di hemû pêngavên giştîya bernameyên teşvîqa ziman de, divê giraniyeke rewa ya zimanên cuda hebe. Elementên wekî ELBE (hatina li rastî zimanan) Port Folye ya ziman, konseptên dîdaktîka ziman ê entegrebûyî, di perwerdeya mamosteyan de dîdaktîka ziman a hatiye koordînekirin yê vê ne. Bi taybetî jî, bernameya perwerdeya dersa ziman a destpêkê ya zarokan divê di hundirê bernameya perwerdê ya herêma lê ne de hatibe bicihkirin û wekî encameke HormoS-Konkordat were pêşdebirin.

C- Dersên ziman ên peywendîdarê tevahiya zimanên li dibistanên dewletê û dersa peywendîdarê zimanê destpêkê (Qûrsên HSK) divê hev temam bikin û ji ber vê jî divê bikaribin bi hev re werin koordînekirin. Mînak; ji bo dersa ziman û teşvîqa ziman divê planekî di çerçoweya hevbeş de û rawestîneke hevbeş a pedagojîk hebe. Kadroyên fêrkar ên di zimanên destpêkê de (Qûrsên HSK) xwediyê jêhatîniyên taybet û rayekariyan in. bi navgîniya bername û projeyên di dibistanên dewletê de hevpar tîn pêşdebirin dikarin ev werin nasîn û ji vana sûd were girtin.

D- Ji bo hatina di derheqê van daxwazan de, divê ji kadroyê fêrkar re derfetên baş ên xebatê werin pêkanîn. Ji bo vê, di çerçoweya mafên wekhev de, derfetên xebatê û bernameyên perwerdê yê têrkar ên hundirê pêşeyî grîng in. Di pirzimanîyê de, ji bo pêşdeçûna dibistanên dewletê, divê dema pêwîst û çavkaniyên finansê werin pêşkêşkirin. Mamosteyên dibistanên bilind ên pedagojîyê, zankoyan û navendên ziman ên rayekar ên hatine plankirin ên di qada pirzimanî û zimanên cîhereng de dixebitin, di hemû qonaxan de, ji perwerde û perwerdeya hundirê pîşeyî û ji kirina lêgerînên li gorî wê, berpirsyar in. ji bo vê di asta netewî û navnetewî de xebata bi hev re û li gorî vê kredî ya lêgerîn û pêşdebirinê pêwîst e.

4- Encam: Pêşeroja dibistanên dewletê, ji bo her kesî pêkanîna mafê perwerdeyê, di pirzimanîyê de radizê. Ev jî tenê bi karkirina saziyên perwerdê ya bi organîzasyonên komên ziman ên cîhereng û bi welatên hatinê re, ji bo dersên ziman ên destpêkê (Qûrsên HSK), naverok,



organîzasyona dadî û bi hilgirtina berpirsyariya finansî dikare were pêkanîn. Ev jî ji bo dibistanên pêwîst divê di çarçoweya pêkanîna HemoS-Konkordat de werin çêkirin.

Di civîna sazîrînê ya komîteya peywendîdarê zimanên destpêkê ya di 22 Îlon 2007an de hat serastkirin û erêkirin.

Zürich 28. November 2007 Zeliha Aktas